

# Pêşdibistan ji bo zaroka te ye

BIROŞÛREK LI SER PÎLANAPERWERDEYÊ YA PÊŞDIBISTANÊ



*Skolverket*



## Tu giringî

Tu yî yê herî nêzîkî zaroka xwe. Ji bo wê yekê bîrûbaweriyên te giranbihane li pêşdibistanê. Heger tu bîrûbaweriyên xwe bêje wê hêsanîr be ji bo personalan ku tiştê ji bo zaroka te pêwîst be bidin wî. Ji bo ku tu zanibe ka pêşdibistan çawa digere divê tu bi wan re be.

## Berbi armancek wekhev

Hikumetê pîlanaperwerdeyê ya pêşdibistanê amade kiriye, li wir hatiye nivîsîn li ser bingeheên giring yê pêşdibistanê û bê erk û armancên pêşdibistanê çine. Bi xwendina pîlanaperwerdeyê ya pêşdibistanê tê bi zanibe ka tê çi hêviyan û daxwazan ji pêşdibistê bike.

Pêşdibistanên belediyên û pêşdibistanên serbixwe jî hene. Ji bo pêşdibistanên belediyên komîteyeke siyasî hîlbijartî heye. Ji bo yê serbixwe heyetek heye. Hemî pêşdibistan divê ligor pîlanaperwerdeyê kar bikin.

Wek rêbaz pêşdibistan ji bo zarokên 1 heta 6 salî ye. Ji heqê hemî zarokên di navbera 3 û 6 salan de ye bê pere 525 seetan di salê de herin pêşdibistanê.

»Li pêşdibistanê wê zarok  
bi kesên mezin yê ku  
imkanên her zarokekî bibînin  
re rûbirû bibin.«

Ji PÎLANAPERWERDEYÊ YA PÊŞDIBISTANÊ, LPFÖ (JINÛVEDIRÛSTKIRÎ 2010)



## Gavbigav di fêrbûneke temendirêj de

Pêşdibistan wê bêhna xwe vede li ser hîmên demokrasiyê. Bazar bi giştî li ser wê ye ku personal hewayek vekirî û demokratik peydebikin ji bo her zarokek bi nîrxê xwe û yê kesên din jî bi hev re bijî.

Xebata pêşdibistanê bi pedagojiyê ku wê şopa xwe bide xwiyakirin li ser lînêrîn, perwerde, terbiye û fêrbûnê temamiyekê ava bike. Ev tê wê manê ku pêşdibistan di dereceya yekê de ji bo xatîrê zaroka te ye, wekî dî jî wê mecalê bide te jî ji bo tu bikaribe bixwêne û kar bike.



Di pîlanaperwerdeyê de nivîsîye ku lîstik girînge ji bo pêşketina zarokê û fêrbûnê. Personal divê girîngiyê bide bîrûbaweriyên zarokê, xwestek û serpêhatîyan di pîlankirina xebata rojane de. Zarok divê mecala xwe îfadekirinê bi awayên corbecor bidest bixe, bi serê xwe û bi kesên din re, wek nimûne bi riya musik û stranê, resm, reqs, şano, peyv û nivîs.

Zarok divê mecalê bibîne ji bo çand û kesayetiya xwe pêşbixe. Pêşdexistina ziman ji bo zarokê cihekî girîng digre di pêşdibistanê de. Pêşdibistan divê alîkar be ji bo zarokên zimanên wan ne swêdi ye mecalê bidest bixin da zimanê swêdî û yên xwe yê dayikê jî bi pêşbixin.

Pêşdibistan wê pêşiyê liber rolêncinsî û corêncinsî yên kevnare bigre. Hemî keç û kur wê îمكانên wekhev bidest bixin ji bo pêşketina xwe bêyî ku pêşî liber were girtin.



## Her pêşdibistanek bêhempaye

Pîlanaperwerdeyê wê garantî bike ku pêşdibistan ji bo hemî zarokan wekhev başbe, ew li ku jî bijîn. Ji ber ku hemî dibistan ligor yek pîlanaperwerdeyê diçin û armanca wan jî yeke. Lê belê awayê wan yê xebatê dikare ne wekhev be. Tiştê ku li pêşdibistanekê were dibe ku li yeke din neyê. Çalakî û xebat divê ligor zarokan were kirin.

Beledî yan jî heyeta îdareye pêşdibistaneke serbixwe berpirsiyarên herî li pêşin ji bo pêşdibistanekê. Tu dikare serî li wan bide heger nakokiyek peyde bibe di navbera te û personalan yan şêfê pêşdibistanê de dema hun nikaribin bixwe helbikin.

## » Pêşdibistan wê zarokan bi ilham bike ji bo derdorên xwe keşf bike.«

Ji PÎLANAPERWERDEYÊ YA PÊŞDIBISTANÊ, LPFÖ (JINÛVEDIRÛSTKIRÎ 2010)





## Hevkarî bi malbatan re

Di pîlanaperwerdeyê de nivîsiye ku xebata pêşdibistanê wê bê meşandin bi nêzîkayî û bahweriyek temam bi hevkarîya malbatan re. Ji bo wê yekê giringe ku tu bi personalan re bi peyive heger tiştekî ku tu lê difikire hebe. Wextekî baş ew e di dema danîn û anîna zarokê de. Hingî wê personal ji bo te bêjin ka zaroka te roja xwe çawa derbas kiriye. Tu jî dikare hingî bahs bike ji bo personalan heger tiştekî bi taybetî qewimîbe ku wê başbe ew jî zanibin.

Personal wê wextekî ji bo te peyde bikin ji bo bahsa zaroka te bikin, ka ji cihê xwe xweşe û pêşketin pêre çêdibe û çawa pêşdibistan dixebite. Pîlanaperwerdeyê wê alîkar be ji bo guftûgoyê.

»Pêşdibistan divê şên be,  
ewle be û hînker be ji bo  
hemî zarokên têkildar.«

Ji PÎLANAPERWERDEYÊ YA PÊŞDIBISTANÊ, LPFÖ (JINÛVEDIRÛSTKIRÎ 2010)



## Ma tu dive hemî pîlanaperwerdeyê bi xwêne?

Pîlanaperwerdeyê li hemî dibistanan heye. Tu dikare  
pîlanaperwerdeyê bi xweze yan jî derxe ji malpera  
daîreya skolverket [www.skolverket.se](http://www.skolverket.se)

ISBN 978-91-87115-16-5

Grafisk form: AB Typoform

Omslagsfoto: Maskot

Foto inlaga: s 2 NordicPhotos, s 3 Kzenon/Shutterstock,

s 4 Yulya Shilova/Shutterstock, s 5 Michael McLain, s 6 NordicPhotos

Skolverket 2011

*Skolverket*